Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1270 4-Gulan-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Dermanê gelek derdan: Kelx



Navenda Nûçeyan

**Hemû cotkar, karker û gundî pincarê kelxê ji nêzîk ve nas dikin. Lê ji ber ku wekî pincarê kelbeş, harik, strîzerk, tolik, ficêla û xerdelê nayê xwarin, zêde sûdên wê yên tenduristiyê nayê naskirin û nayê zanîn. Bêtir bi striyên xwe yên wekî derzî û şujinên tûj û kovika tovên xwe yên tûtik tê nasîn.**

Pincarê Kelxê, her çend bi striyên xwe yên tuj mirovan diêşîne û dijwar e jî, ji bo tenduristiya mirovan ji gelek nexweşiyan re derman e. Li bajarên Kurdistanê pinçarê kelxê li her derê çê dibe. Pincarekî bi strî ye. Hem pelê wê û hem jî qîfarê wê bi strî ye. Bi taybet dema diseride û tov digire, kulîlkên ku di kavikatov de vedibin rengê wan şîrik, tutîk û xemrî ne. Hinek ji wan jî sorgewez in. Bi taybetî her ku dendikê tov tijî dibin, striyên li dora tav wekî mertalên parastinê rêz bûne jî dijwar dibin.

Pincarê kelkê bi striyên xwe û kovika dendikê xwe tên zanîn. Bi zimanê latînî ji bo pincarê kelkê dibêjin”Milk Thistle”. Wekî dermanê tipa xwezayî tê zanîn. Li gorî lêkolînên pisporan gelek fêde û sûdê wê yên ji bo tenduristiyê hene.

Nebat ango pincarê kelxê di demsala biharê de şîn dibe. Di meha çile û sbatê de tovê wê zîl dide û bi taybetî di mehên Bihar, Nîsanê de bejnê davêje. Di meha Nîsan, Gulanê de jî diserike û kulîlk lê dikevin. Ji pelê wê bigire heta qîvarê wê, ji qîvarê wê bigire heta kovika tovên wê tev bi strî ne. Di salên ku barana wê zêde û Bihara wê germ be zêde bejnê davêje û bereketa wê zêde ye. Bejna wê hin caran bi qasî metreyekê bilind dibe û kovikên tovê wê bi qasî kefa destê mirovan ango mastêrekê mezin dibe. Piştî bejnê davêje, di orta kovika tovê wê de çîçekên rengê xemrî û tutîk vedibin. Ji bo her dendikek tov çîçekekê vedike. Di kovika tov de bi sedan çîçek vedibin. Ew çîçekên vedibin bi hasî 20 roj ango mehekê vekirî dimînin û dendikê tovê tijî dikin.

### Dendikên kelxê dermanê gelek derdan e

Kelx her çend bi striyên xwe mirov û sewalan dûrî xwe dixe jî, bi rengê kulîlkên xwe û sûda dendikên xwe mêş, perperok, moz û kêzikan li xwe kom dike û zikê gelek sewalan têr dike. Li gorî pisporên tenduristiyê dendikê kelxê ji aliyê madeya antîoksîdana silimarin (slymarin) ve gelek dewlemend e. Ji ber madeya antîoksîdanê ji bo gelek nexweşiyan derman e. Ji ber minarel, vitamîn û antîoksîdanê ji bo gelek nexweşiyên fatreşk, kezeb, zirav û gurcikê derman e. Piştî diseride û tov lê dikevin, bizin gelek ji tovê wê hez dikin û ji bo xwarinê êrîşî kovikên tovê wan dikin. Mêşên hingiv ku ji kulîlkên wê xwedî dibin, tav û bereket dikeve hingivê wan. Her wiha dîsa bizinên ku ji tovê wê diçêrin, bereket dikeve şîrê wan. Ji ber madeyê silimarin xwedî taybetmendiya antioksidan, antiviral û antînflamatuare. Ev jî ji bo gelek nexweşiyan dibe derman. Li dijî nexweşiyên wekî hepatit, fatreşk, kezebê derman e. Dîsa ji bo nexweşiyên mahden jî gelek xwedî sûd e. Rêjeya şekirê xwînê, hevsengiya kolesterolê jî kontrol dike û hevsengiyekê ava dike.

# Li derveyî Pergala Rojê delîlên herî bihêz ên têkildarî jiyanê hatin tespît kirin

Navenda Nûçeyan

**Zanyaran ragihand ku wan li atmosfera gerestêrkeke 124 salên roniyê dûrî dinyayê nîşaneyên têkildarî jiyanê yên gelekî xurt tespît kirine. Hin zanyar jî pêşniyar dikin ku divê ev yek bi baldarî were lêkolînkirin.**



Gerestêrka bi navê K2-18b, di nava Komstêrka Şêr de cih digire û ji ber avaniya xwe ya dişibe okyanusê, tê texmînkirin ku lê potansiyela jiyana mîkrobîk heye. Lêkolîneran ji bo tespîtkirina nîşaneyên jiyana li vê gerstêrkê Teleskoba James Webb bi kar anîn.

Ekîba ji astronomên Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) û Îngilîstanî pêk tê, li atmosfera K2-18b’yê ji bilî xazên metan û karbondîoksîdê ku ji bo jiyanê xazên girîng in, hin kîmyasalên ku li cîhanê ji aliyê zindiyan ve tên hilberandin jî tespît kirine.

Di nava van kîmsayalan de madeyên dîmetîl sulfur û dîmetîl dîsulfur jî cih digirin. Ev made li cîhanê bi taybetî li cihên avî ji aliyê zindiyên mîkroskobîk fîtoplanktonan ve tên hilberandin.

Astrofîzîkzanê ji Zanîngeha Cambridgeyê Nikku Madhusudhan daneyên hatine tespîtkirin nirxand û ev yek anîn ziman: ‘’Tiştên ku me tespît kirine, yekem nîşaneyên girîng in ku îhtimala li gerestêrkeke din jî aktîvîteya bîyolojîk heye radixe ber çavan.’’

Her wiha Madhusudhan diyar kir ku ji bo encameke teqez ev nîşane têrê nakin û divê lêkolînên zêdetir werin kirin. Gerstêrka K2-18b’yê ne pir dûrî Pergala Rojê ye ne jî zêde nêzîk e ku ev yek jî îhtîmala ku lê jiyan heye xurttir dike. Yanî dibe ku li ser rûyê gerstêrka berbehs av hebe.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku Teleskoba James Webb’ê cara ewil di sala 2023’yan tespît kiribû ku li vê gerstêrkê metan û karbondîoksît heye. Daneyên ku di demên dawîn de hatine bidestxistin jî dubare nîşan didin ku divê li ser vê gerstêrkê lêkolînên zêdetir werin kirin.

Sudoku: Bersiv 38

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 8 | 3 | 2 | 1 | 6 | 5 | 9 | 4 |
| 2 | 1 | 4 | 9 | 5 | 8 | 3 | 7 | 6 |
| 6 | 9 | 5 | 7 | 4 | 3 | 2 | 8 | 1 |
| 9 | 2 | 7 | 6 | 8 | 1 | 4 | 3 | 5 |
| 1 | 3 | 6 | 5 | 7 | 4 | 9 | 2 | 8 |
| 5 | 4 | 8 | 3 | 2 | 9 | 1 | 6 | 7 |
| 4 | 5 | 2 | 8 | 3 | 7 | 6 | 1 | 9 |
| 3 | 7 | 9 | 1 | 6 | 5 | 8 | 4 | 2 |
| 8 | 6 | 1 | 4 | 9 | 2 | 7 | 5 | 3 |

Sudoku:Pirs 39

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 8 | | 2 | | | | |
| | 1 | | | | 3 | 4 | | 9 |
| | | | 8 | 4 | 5 | 6 | | 2 |
| 1 | | | | | | 8 | | |
| | 8 | 7 | | 9 | | 3 | 2 | |
| | | 5 | | | | | | 1 |
| 8 | | 3 | 5 | 1 | 2 | | | |
| 9 | | 6 | 3 | | | | 5 | |
| | | | | 8 | | 2 | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Tovê firîzê ye/rayê firîzê ye:**
- Zû pir dibin; li her derê belav dibin; pêşî lê nayê girtin; xwe digihînin her derê; dawî lê nayê.

**Tovê parparê ye:**
- Bi heman wateyê.

... û bireve:
- Pir in.

*Sêv û bireve.

Ûrê ga rijiyaye:
- Îsal berhem pir e.

**LI SER ENCAMÊ**

**Ezê pirêzeya te bibînim:**
- Ezê di dawiyê de bibînim ka tiştên tu dibêjî rast in, yan na.

**Kurt û kurmancî:**
- Bê ku ez direj bikim; pêwîst nake em li ser direj biaxivin.

**Serê sed newalî newalek, serê sed gotinê gotinek:**
- Bi kurtayî; bi cewher; kurt û kurmancî; encam.

Te xwe dît?
- Te şaşiya xwe dît?

**Tu çi bixî beroşê tuyê wê jê derxî:**
- Ji karê baş encama baş, ji karê xirab encama xirab derdikeve.

**LI SER BERTÎLÊ**

**Bertîl dar û beran dihelînin:**
- Tişta ku bi bertîlan neyê çareserkirin nîne.

**Çav ji çavan şerm dikin, bertîl beran nerm dikin:**
- Tişta ku bi bertîlan neyê çareserkirin nîne.

**Dev dixwe çav fedî dike:**
- Kesê bertîlê dixwe ji kesê bertîl dayî şerm dike.

**Devê wî şîrîn kir:**
- Bertîl dayê.

**Devê wî şor kir:**
- Bi heman wateyê.

**Hestiyek avêt berê:**
- Ji bo ku dengê xwe neke tiştek dayê.

**Kar ket bertîla gû ket rewşa feqîra:**
- Cihê bertîl lê hebe yên herî pir zererê bibînin xizan in.

**Kar ket bertîla agir ket feqîra:**
- Bi heman wateyê.

**Qirika wî şil kir:**
- Dilê wî xweş kir; tiştek dayê; bertîl kir.

**LI SER JÎRBÛN Û JÊHATÎBÛNÊ**


**Berî şeytên çêbûye:**
- Keysbaz e; jîr e; jêhatî ye; nayê xapandin.

Berrnas e:
- Kesê mirovan zû nas dike, yan ji dirofên wan, wan nas dike ji bo wan tê gotin.

Bersiva wî di berîka wî de ye:
- Di axaftinê de ti kes pê nikare; bersiva wî amade ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Sûriya nû bê îradeya jina azad nabe



Endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê Sureya Hebeş da zanîn ku Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî biryardariya gelê Kurd ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û misogeriya mafê gelê Kurd, kir yek û got “Derketina hêza jin di konferansê de, encama konferansa netewî a jin, zindî kir”.**R-2**

# ‘Banga Aşitî û Civaka Demokratîk banga ronahiya mirovbûnê ye’



Rêveberê Insiyatîfa Sûrî a Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir diyar kir ku banga Rêber Apo ya ‘Aştî û Civaka Demokratîk’ banga ronahiya mirovbûnê ye û wiha got: “Banga Rêber Apo çareseriya hemû aloziyên gelan e û rêya wekhevî û biratiyê ye.”**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1270 4-Gulan-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# YEKÎTIYA KURDÎ YEKÎTIYA SÛRIYÊ YE

Ji destpêka Şoreşa 19’ê Tîrmehê ve û heta niha, gelê Kurd berdêlên giran dan û di encamê de destkeftiyên dîrokî qezenc kir. Ji bo parastina destkeftiyan çavê gelê kurd herdem li yekrêziya tevahî aliyên Kurdî bû. Ji xwe Banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk bû bingeh ku Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li dar bikeve û bi encam bibe. Yekrêziya Kurdî ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo tevahiya Sûriyê pir girîng e, ji ber ku yekrêziya Kurdî misogeriya yekîtiya Sûriyê ye.**R-3**






# Emerîka, Îran û dosya nuklerî

Gotûbêjên fermî yên di navbera Tehran û Washingtonê de di meha Nîsanê de 3 caran pêk hatin. Herdu aliyan ew wekî erênî û avaker bi nav kirin, da ku bernameya nuklerî a pêşketî ya Îranê çareser bikin.**R-5**



# Faris Osman; Xemxwarê dîrok û dewlemendiya welatê xwe

Nivîskar Faris Osman da zanîn ku ew xwe di nava nivîsên xwe de dibîne û wiha got: “Gelê me hewcedarê naskirina dîroka xwe ye, ji ber ku dîroka gelê kurd ew dîroka herî dewlemend e.”**R-7**



**Di pêvajoya dudan de, “Yekîtiya Netewî” pêk hat!**
Ahmet Aktaş **R-4**



# Civakbûyîn û parastina civakê; parastina mirovahiyê ye

Ji dîrokê heta roja îro di nava şert û mercên zehmet de mirov bi civaka xwe dikarî xwe li ser piyan bihişta. Civakbûyîn li ser têghiştina jiyaneke hevpar pêk tê, lê ya girîng ku dihêle civakbûyîn li pêş bikeve û ji aliyê desthilatdaran ve neyê windakirin, rêxistinbûyîna civakê ye.**R-6**

# Gelo hebûna jina azad di civakê de ewqas bi hesab û tirs e?

Esma Mistefa

Divê em bi pirsa gelo jina berhemdar û afrîner layiqa jiyaneke bi vî rengî ye? dest pê bikin. Em ê zêde nekevin hurguliyên ku sîstema desthilatdar çawa dixwast û heya niha jî konsepta jinê bisipêre zilamê ku afirandiye, dike. Pergal bi gelemperî li ser bingeha jirêderxistina xwebûn û cewhera jinê piştî serdema serdest a Someran hatiye avakirin. Ji lewra guhartina vê hişmendiyê di roj û şevekê de, wê ne mumkin be. Bi demê re her çendî li hember vê yekê têkoşîna guhartina rastiya jin hatibe kirin jî, lê di asta ku bibe berhemdar û encamgir be, nehatiye ponijandin û pêkanîn. Di gelemperî de rêxistinên famînîst ku xwestine li hember vê yekê şerê hebûnê û guhartina zihniyet, derketin li îdeolojiya ku dane avakirin û li ser wê tevgeriyane; şaş û ne li gorî qanûna xweza û civakbûyênê bû. Ma gerdon tenê bi jinê tê sazkirin û jiyankirin! Helbet ev ne pêkan e û li dijê firikra azadiya her du zayenda ye. Ji lewera jî bi ser neketin.

Ji derveyî pergala moderníteyan kapîtalîst ku lêberalîzmê esas digre. Bi fikarên olî û nijadperstî di her milî de jin sînordar kirin. Di aliyekî de bi azadiya sînornenas atmosfera jirêderketinê ava kirin û weke ku tu kes karê xwe bi nêrîna ferd nîne û di aliyê din de bi zihniyeta olperest jin xistin qefesê. Bi firkarên olperest û dogma her tişt ji jinê re şerm û ne rewa dîtin. Heta jin gihişt asta ku bi wê rastiyê bawer be. Em bala xwe bidinê bi siyaseteke herî zirav jin di her alî de bikar anîn û li gorî xwe saz kirin. Em ê bi vê yekê bigihînin mijara




ku ez dixwazin balê bikşînin ser wê… Piştî rûxandina rêjîma berê (Baas) di Sûriyê de, gelo di sedsala 21'emîn de çima em bi qirika jinê digrin û vedikşînin serdema tarîtî û reşiyê? Em ê nebêjin ku sîstema berê pir bedew û xweşik bû ji ber her xetek weke ku me aniye ziman bi polîtîkeya xwe a bi heman armancê tevgdigere. Zihniyeta tunehesibandina jinê ji bo çi wê ewqas bi kok û bingeh be? Hebûna jina azad di civakê de gelo ewqas bi hesab û bi tirs e? Bi taybet rewşa jina Sûrî berê û niha jî tu ferq û pêşveçûnek nehat jiyankirin. Di nava sîstemeke olperest de tam jin di Sûriyê de derbasî qonaxeke din a desthilatdariyê û tunekirinê kirin. Ev yek jî di hundir 4 heyvan de ku çawa HTŞ'ê hate ser serweriyê ji siyaseta jin xwe bigire (Biheşimîne), mudexeleya li cil û şemala wê, di sîstema xwendinê de, her wiha destdirêjiyên ku hatine jiyankirin di demên dawiyê de û herî dawî komkûjiyên ku li ser pêkhateyan pêk anîne û sazkirina destûra ku hebûna jinê têde nehatiye diyarkirin. Bi van diyardeyan pêşeroja jin di Sûryê de.. tê femkirin. Gelo di sedsala ku silogana Jin Jiyan Azadî li çar aliyên dinyayê tê libakirina ev yek gengez e?! her çiqas zimanê diyarker bidin guhartin jî lê hişmendiyek olperest ku xwe dispêre bingehên gelek xurt yên weke El Qayîde û DAÎŞ'ê wê di xeta xwe de zû zû neyên guhartin. Hikumeta ku niha di Sûriyê de tê dîtin, ji komên çeteyan yên ku bi sala ye komkujî, kuştin, darvekirin, şewtandin, dizî û talankirin di Sûriyê de kirine ye. Ev komên çeteyan ku heyanî niha jî ji aliyê Tirkiyê ve têne biştevanî kirin, bi hilwşandina rêjîma û hatina Colanî re xwe bihêztir û xurtir dîtin.

Gelê Sûriyê a ku bi hilweşîna rêjîma berê re weke ku Sûriyê rizgar bû û 14 sal ji qirîz û qeyranan bi dawî bû, gelo piştî komkujî û piratîkên ji laiyên Hikumeta nû hatine dîtin ve ma rastî azadiya ku 14 salin li bendê bûn ev e? di asta yekem de ev komên ku weke şagirt û bermahiyên DAÎŞ'ê tên dîtin. Qirkirina gelê Kurd armanca wan a yekem bû. Ev rastiyeke û tu kes nikare biştguh bike. Dema derketina gelê Efrînê ji herêma Şehbayê jî em bi xwe şahidê gotinên ku "Biçin kur herin dawiyê de em ê xwe bigihînin we, QSD'ê we ji destê me xilas nake"! bi van gotinan û bi sedan gotinên bê exlaqî layiqî jin û gel didîtin.

Tevgera Azadiya Kurdistan di xeta xwe ku "Avakirina civaka qxlaqî û polîtîk, parastina ekolojî û azadîxwaziya jin" esas digire. Di piratîzekirina vê îdeolojiyê de zêdetirê 50'î salî ye têkoşîna leşkerî û bîrdozî dike ku guhartina pergala kapîtalîzmê ava kiriye, dike û altirnatêfa wê civak û mirovahî vegera mîraseya xwe a xweazayî ku tê de her kes, civak, netew, ol û bawerî bi maf û hebûna xwe jiyan bikin. Rêber Apo li ser vê bingehê têkoşîna guhartina zihniyeta global da meşandin û Tevgera Azadiyê di vê xetê de bi îsrar û net berxwedaniyê dimeşîne. Bi Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re ku gelê kurd li ser van mîrasan hatibû mezinkirin û perwerdekirin. Bi rêxistinbûna xwe li hember hemû êriş û siyasetan li ber xwe dan û têkoşîna doza azadiya gelê kurd meşandin. Muma vê yekê ji Rojava pê ket û sîstema Netewa Demokratîk a ku bingeha îdeolojiya me ye, di encamam bedelên giran de pêk hat. Şorşa Rojava bû şoreşa azadiya jinê, di pêşengtiya jina Kurd de, bilindkirina dengê jinan a ji bo azadî û demokrasiyê belav bû. Li ser van bingehan hemû pêkhateyên di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de piştgiriya vê yekê dikin û têkoşîna hevpar dimeşînin.

Di Sûryê bi taybet de rewşa jin divê were veguheztin ku tê de 14 sal ji şoreşeke bi pêşengtiya jin tê birêvebirin. Ev şoreşa ku bi jinê hatiye serxistin, muhra xwe li hemû şoreş û tevgerên jin di cîhanê de xistiye. Bi silogana Rêber Abdullah Ocalan a Jin Jiyan Azadî bûye sembola jina azad û pê jiyan tê xemilandin. Ev yek bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê re her çû zindî bû û di nava jinên cîhanê de hate naskirin. Di nava vê şoreşê de di encama bedel, têkoşîn, berxwedanî û şerkirina li hember zihniyet ev destkeftî hatin bidestxistin û parastin. Di qadên bîrdozî, leşkerî, dîplomasî, siyasî û civakî de bi pêşengtiya jina Kurd jinê xwe îsbat kir. Bê guman di salên durûdirêj de ne pêkan e rewşa jin di Sûriyê de veguhere rewşa beriya 5 hezar sal.

Em niha di Sûriye nû de dibînin ku vê yekê bi îsrar dixwazin pêk bînin. Pêkanîna vê di demeke wiha de divê rê li ber neyê vekirin. Hikumeta nû her çendî di qilifê xwe ya dixwaze raber bike de xwe nerm dike, lê di cewher û zihniyet de xwedî fikar û bîrdoziyeke olperest, nijadperest û serdest e. Bi sedan mînakên ku vê yekê piştrast bikin jî hatin jiyan kirin. Jina ku bi qalikên kevneşopiyê hatibû xapandin, divê careke din nekeve xefka hişmendiya ku dixwazin mayînde bikin. Armanca ku tê dîtin avakirina Sûriyeke xwedî hişmendiya olî û dînî ye. Lê piştî ewqas guhartin û têkoşîn wê ev yek pêkan nebe. Hele hele bi hebûna sîstema Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê.


Em vê yekê tenê ji bo Sûriyê nabêjin. Lê belê pergala heyî bi her awayî li dijî jinê siyaseta Şerê Taybet û tunekirinê dide meşandin. Ji lewra ger em rastiya xwe nas dikin û têdigihêjin divê li ser bingeha îdeolojiya azadiya jinê em xwe biwestînin û li hember zihniyet û pergalê şerê xwebûn û azadiyê bimeşînin. Ev pêvajo ne pêvajoya bêdengkirin û tirsê ye… pêvajoya serîrakirin û guhartinê ye.

# Sûriya nû bê îradeya jina azad nabe

Navenda Nûçeyan

**Endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Sureya Hebeş da zanîn ku Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî biryardariya gelê Kurd ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û misogeriya mafê gelê Kurd, kir yek û got "Derketina hêza jin di konferansê de, encama konferansa netewî a jin, zindî kir".**

Girêdayî Konferasa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî û hebûna jin tê de. Endama Meclisa Giştî a PYD'ê Sureye Hebeş ji rojnameya me re axivî.



**'Mîraseya şoreşê bi serkeftinên heyî re bi encamp dibe'**

Sureya axaftina xwe bilêvkirina keda jin di Şoreşa Rojava de destpêkir û got: "Di serdema heyî de înkarkirina hebûn û keda jinê a sedsalan ji dîrkê û heya niha, êdî nayê pejirandin. Jina kurd jî ev yek di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de îsbat kir. jina ku li ser hîmên Felsefeya Rêber Apo xwe perwerde kirine, bi destpêkirinaz vê şoreşê re di hemû aliyên rêxistin û leşkerî de xwebirêxistin kirin û ev mîras di serkeftinên ku em niha dibînin de bi encamp dibe".

**'Dijmin ne li benda vê gave bû'**

Sureye da zanîn ku Konferansa ku hatiye lidarxistin muhra xwe li dîrokê xist û bi îradeya jin ev yek bi encam bû û wiha domand: "Di demeke herî girêng ku Sûriyê di pêvajoyekê nû re derbas dibe, partiyên kurdê rûxmî hemû nakokî û neyekbûyîna wan di vê pêvajoyê de gavekî dîrokî ku tu kesî texmîn nedikir hat avêtin. Helbet ev yek jî bi hemdemiya guhartinên di Sûriyê de hatine çêkirin re hat pêkanîn. Konferansa Yekîtiyê helbet di encama xebat û hewildanên pir mezin de hate lidarxistin. ji lewra dijminê gelê Kurd bi taybet li benda vê yekê nebû. Bi taybet îradeya jink u di wir de derketiye çawa jin bi hebûn û bîrdoziya xwe divê di cihê biryardariyê de cihê xwe bigire. Bi taybet di Sûriyê de ku yek ji bendên encamnameyê bû, divê jin bi awayekî hekhev di nava saziyan de cih bigire".

**'Sûriye nû wê bê îradeya jin nebe'**

Sureya di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: "Konferansa netewî a jin ku hatiye lidarxistin ku îradeya hemû jinên herêmê di wir de derket û ji bo siberoja Sûriyê nîqaş kirin. ev îradeya jina azad di konferasa giştî de hate derketin. ku bi vê yekê re tekez kirin wê Sûriye nû bê îradeya nin nebe".



# Faris Osman; Xemxwarê dîrok û dewlemndiya welatê xwe

## Nivîskar Faris Osman da zanîn ku ew xwe di nava nivîsên xwe de dibîne û wiha got: "Gelê me hewcedarê naskirina dîroka xwe ye, ji ber ku dîroka gelê kurd ew dîroka herî dewlemend e."

Hêvî Keleş/ Qamişlo

Nivîskar Faris Osman di sala 1969'an de li taxa Hilêliyê ya girêdayî bajarê Qamişlo ji dayîk bûye. Wî xwendina xwe li dibistanên Hilêliyê xwendiye û beşa Dîrokê li Zanîngeha Şamê qedandiye. Piştî qedandina zanîngehê ew bûye mamoste û li gelek dibistanên Qamişlo karê mamostetiyê kiriye. Di dema niha de ew endamê Partiya Demokratîk a Pêşverû a Kurdên li Sûriyê ye. Derbarê jiyan, kar û xebatên xwe yên rewşenbîrî, nivîskar Faris Osman ji Rojnameya me re axivî.

**'Ez ji zaroktiya xwe ve mijûlî nivisandinê bûm'**

Nivîskar Faris Osman diyar kir ku wî ji zaroktiya xwe ve dest bi nivîsandinê kiriye û wiha got: "Ji dema ku ez zarok bûm min ji nivisandinê hezdikir û hertim pênûs û lênûsa min di destê min de bûn û çi dihat ser bala min, min dinivisand û dikir weke çîrokan. Bi demê re nivîsên min pêşketin. Pêşketina ku di nivîsên min de çêbûn hişt ku ez gavekê bavêjim û nivîsên xwe bikim pirtûk. Bi dehan gotar û lêkolîn min di malperan û rojnameyan de hatine belavkirin. Ji 2002'an de û pê de min dest bi çapkirina pirtûkan kir. Tişta ku hişt ku ez bi rehetî binivîsim malbata min bû, ji ber ku ji kesê nivîskar re cihek taybet pêwîst e, malbata min di vî aliyî de alîkariya min kir. Tişta balkêş ew e ku ez hertim nivîsên xwe piştî seat 12'ê êvarî dinivîsim, ji ber ku ez hîz dikim ku piştî saet 12 mejiyê min vedibe û derbasî cîhaneke din dibe, dikevim kurahiya xeyalan û wan jî dikim nivîs."

**'Nivîskarê navdar Selîm Berekat bandor li min kir'**

Osman da zanîn ku dema mirov karekî rast bike helbest wê zehmetiyan jî jiyan bike û wiha got: "Ez weke nivîskar bêhtirî xwe bi lêkolînan re mijûl dibim. Ji ber kêmbûna jêderan ez di lêkolînan de zehmetiyan dikşînim. Nivîsandinên min bêhtir di beşê kurdî de ne lewma jêder kêm in û ev dihêle ku lêkolîn demek dirêj bixwaze. Ji ber kêmbûna jêderan û yên hene jî bi zimanê erebî hatine nivîsandin, ez nivîsên xwe bi erebî dinivîsim û ev jî weke kêmasiyê dibînim. Di heman demê de ez di belavkirina nivîsên xwe jî zehmetiyê dibînim, ji ber kêmbûna xwendevanan. Bi dehan simînerên me çêdibin lê mixabin yên temen mezin tenê hazir dibin lewma ev dihêle ku tu dûrî xwendevanên xwe yên nifşên nû bikevin, ew nifşê ku tu karibe bandorê li wan bike. Yê ku bandor li min kir Selîm Berekat bû. Selîm Berekat bandora wî li ser nifşên me hebû, piraniyê nivîskarên bajarê Qamişlo bandora wî li ser wan hebû. Herwiha yê bêhtir bandora wî li me dibû Nivîskar Kemal Mezher û yê ku me dixwest bibe



weke nimûne ji me re Cegerxwîn e.Di heman demê de di wê demê de yê piştgiriya me dikir ku em binivisînin Ebdulhelîm Derwîş bû. Lê yê bandora herî mezin li min kir û hişt ku binivisînim Selîm Berekat bû."

**'Bi derketina soşyal mediya mirov dûrî xwendinê bû'**

Nivîskar Faris Osman di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Weke em niha dibînin ku rewşa herêmê ne zelal e, vê yekê hişt ku gelek kesên bi bandor ji welatê xwe derkevin, herwiha derketina Soşiyal Mediya jî hişt ku mirov dûrî xwendinê bikevin. Di heman demê de dema tu lêkolînekê tîne û tu zehmetiyan pê re bikşîne heta tu belgeyan bide hev, hin kes tên van lêkolîn û nivîsên te li ser navê xwe ji xwe re dadixînin ser malperên xwe bêyî ku destûra te bixwazin, ev jî ji min û piraniya nivîskaran re dibe weke xemgîniyekê."

**Berhemên Faris Osman ev in:**

Diyaneta Zeredeştî( Aldiyane Alzeredeştiye).
Kurd û Hêvî Têkiliyên Dîrokî(Al-Kurd we Alemel û Alaqat Altarîxiye).
Kurd li Sûrî. (Al-Kurd fî Sûriya).
Komkujiya Qamişlo( Altefcîr Alirhabî fî Qamişlo).
Yûsif Çelebî çîrok û afrînerî( Yûsif Celebî Alqisa û Alibda'i).
Kurdistan ya nû kurdî ye (Kurdistan Alcedîde Kurdiye).
Newroz name, Newroz di dîrokê de(Al-Newroz fî Altarîx).


# 'Bi helbestên xwe êşa civaka xwe tînim ziman'

Nalîn Ehmed/Qamişlo

**Her tim helbest ji bo helbestvanan xwedî wateyeke cuda ye, ji bo jinan bi taybet bûye deriyekî bêhinstandinê ye. Jinan bi hezaran çîrok, stran û helbest carinan li ber dergûşê zarokan, carinan di şer de, carinan ji bo xwezayê ji bo ajal û bax û bostan gotine. Helbestvana jin ya kurd Baso Kurdaxî jî, êş û hesreta li ser bajarê xwe bi nivîsandina helbestan tîne ziman.**

Di Dîroka kurdan de peyv, gotin bi dengbêjiyê heta roja me ya îro xwe parastî ye, bêguman keda jinan jî gelek mezin e. Ji bo vê yekê jî li ser erdnigariya Kurdistanê ya ku tim wek cihê keyf, şahî, şîn, şer, koçberî, xweza û afirandinê bû, jinan ev hestên xwe bi zarokan da heskirin û bi welat û xwezaya re jî parve dikirin. Di vê kedê de her çiqas ku navê bi hezaran jinan tune be jî, yên navê wan heyî mînaka bingeha xurt nîşanî me didin. Bêguman her tişt di vê jiyanê de bi bingehe, eger bingeh tune be nabe. Civak jî bi çand û zimanê xwe tê naskirin. Di demên şer de rola herî girîng û bi bandor, rola çandê ye. Lewra dengbêj, nivîskar û helbetsvan ne tenê hestên xwe, ew hestên mirovan bi giştî tînin ziman.

Helbestvana jin ya bi navê Baso Kurdaxî di sala 1963'an li herêma Efrînê ji dayik bûye. Wê dibistana seretayî li Efrînê qedand û navîn û






amadeyî li Helebê qedand. Herwiha Beso Fakulteya Zanistên Xwezayî li zanîngeha Helebê qedand. Beso di temenê xwe yê 24 salî mamostetî kir. Ji ber şerê Sûriyê Beso ku dayîka sê xort û keçekê ye, di dawî 2015`an de berê xwe da Almaniyayê.

**'Hezkirina ji xwendina pirtûkan min kir helbestvan'**

Helbestvana kurd Baso Kurdaxî li ser hezkirina xwe ye ji danîna helbetan re, ji rojnameya me re axivî.

Beso diyar kir ku hezkirina wê ji xwendina pirtûk û helbestan re, hişt ku ew dest bi nivîsandina helbestan bike û wiha berdewam kir: "Min ji xwendinê hez dikir, di ciwaniya xwe de min gelek roman dixwendin. Di aliyê bilindkirina moral de bavê min rolek mezin lîst. Dema ez di pola nehan de xwendekar bûm, mamosteya me mjarek li ser karker û rola wî ya di civakê de xwest. Min bi hemû hest û hezkirinê dest bi nivîsandina mijarê kir. Dema mamoste daxwaza xwendina mijarê kir, ez bi heyecan bûm, min dest bi xwendina wê kir û bi hêvî li benda nerîna mamosteya xwe mam. Wê demê ji min re got, tu xwedî pênûseke xurt e, şêwaza te ya nivîsandina mijran bi bandor e, xwendin û nivîsandinê bidomîn e."

**'Bi hêviya gihiştina namê me'**

Helbestvan Baso Kurdaxî di derbarê pirtûka xwe ya yekemîn ya bi navê Qîrîna Zeytûnê ku di 2025`an de bi zimanê Erebî nivîsandibû wiha got: "Sedema nivîsandina min ya bi zimanê erebî ew e ku tevahiya mirovan bixwînin. Lewra her kes dizane di demên me de ji ber dagîrkirina Kurdistanê û desthilatdaran, civak ji xwendina bi zimanê dayîkê bê par ma. Lê ev nayê wê wateya ku ez nizanim bi zamanê dayîkê bixwînim yan jî binivîsînim. Ez niha bi her du zimanan helbestan amade dikim."

**'Helbest peyama aşîtiyê ye'**

Li ser xweza û jiyana Efrîn Baso dirêjî da axaftina xwe û wiha got; "Efrîn bi xwezaya xwe ya xweş û bi gelê xwe yê dilsoj ku her tim deriyên wê vekirîne, tê naskirin. Efrîn îlhama min e, tiştê ku heta niha qewimîn di hemû nivîsên min de hatine tomarkirin. Her nivîsek û her çîrokek êşa ku ez tê de derbas bûm, bi hestên tevahiya koçberên Efrîn bi taybetî jin, min nivîsandiye. Bêgoman bandora helbestvanan di rewşên şer de bi bandor e, armanca min û ya hemû nivîskaran ew e ku di riya nivîsên xwe re, em hişyariyê û ragihandina peyama rawestandina şer û rakirina bê edaletiyê ya li dijî gelê xwe û gelên din ên bindest, bikin. Çimkî di baweriya min peyama her nivîskar, helbestvan û rojnamevanekî, ew e ku em kurd alîgirên aştiyê ne, ne alîgirên kuştin û wêrankirinê ne."

**'Hêviya azadiyê'**

Li ser rola helbestvanên jin di civaka Kurd û Ereb de jî, Baso Kurdaxî diyar kir ku, civakê her tim jinan di hemû qadên civakê de, sînordar dikir û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Di narîna min de tevlîbûna jinan û hilbijartina wan di nivîsanidina helbest û pirtûkan de, şikandina van sînora ye. Bêgoman pêşketina jinan pêşketina civakê ye. Ji bo wê ez ji tevahiya jinan û keçên ciwan re vê dibêjim; nehêlin ti tişt di riya we de bibe kelem. Ti ji çi hez bike wê bike. Ji bo pêşketina mirovan jî riya herî rast bê goman, xwendina pirtûka ye."

Herwiha li ser bandora helbestvanan di qadên siyasî de Baso got; di nerîna min ev yek ji mafê siyasetmedaran e, em helbestvan û nivîskar rola ku tê ser milê me hişyarkirine, eşkerekirina rastiyan û belgekirinê ye, ji ber ku pênûs ji çekan zêdetir bandora xwe li ser mirovan dike.

Helbestvana Baso Kurdaxî bi hêviya azadkirina Kurdistanê wiha axaftina xwe bidawî kir: "Helbet min tenê ji ber êş û azarên jiyana xwe, bi taybetî piştî şer û koçberbûna welat helbest nivîsî. Min xwest ji civakê re îspat bikim her çend dem derbas bibe ku heta jin bi giştî bi taybetî jina Kurd, bêyî destek bin jî, ew ê yê herî xurt û bihêz bin. Her peyva ku min anî ziman êş û janên gelê me ye. Di her nivîsê xwe de çîrokek rast ya talankirin û êşek kujer ji dilê rastiya Efrînê tê. Min tu carî ji xeyalan nenivîsandiye û nanivîsim. Hêviya min ew e ku, Efrîn û tevayîya bajarên dagîrkirî, di zûtirîn dem de werin rizgarkirin."

# Civakbûyîn û parastina civakê; parastina mirovahiyê ye

Ji dîrokê heta roja îro di nava şert û mercên zehmet de mirov bi civaka xwe dikarî xwe li ser piyan bihişta. Civakbûyîn li ser têghiştina jiyaneke hevpar pêk tê, lê ya girîng ku dihêle civakbûyîn li pêş bikeve û ji aliyê desthilatdaran ve neyê windakirin, rêxistinbûyîna civakê ye. Civakeke birêxistinkirî û azad jî bi avakirina pergaleke demokratîk pêk tê.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Mirov bi tena serê xwe nikariye jiyana xwe berdewam bike. Ferdê ku ji civaka xwe qut bivaya, ew ferd mehkûmê tinebûnê bûye, ji lewma hêza civak û civakbûyînê yanî kombûyîna mirov gel hevdû, bi hevre tevgerkirin, bi hev şêwir kirin, xwe parastina hev esasê civaka bi hêzbûyî bûye. Bi îfadeyeke din civakbûyîn mîna govendeke ku her kes destê hev digre û dîlaneke bi hevre dike. Ger yek kes bi tena serê xwe govend bike çawa ye û pir mirov bi destê hevdû bigrin û govendê bi hev re bigerînin çawa ye? Bê gûman coşa govenda ku her kes tevlî dibê ji ya yek kesî hîn zêdetire, enerjiya piraniyan hêza moral, hizir, avakirin û gelek tiştên din ên erênî jî derdixîne holê.

### Civakbûyîn û parastin ji hev ne qutin

Ji vê rastiyê dema ku em derkevin rê em ê bibînin ku civakbûyîn û parastin di rastiya mirov de bi hevdû ve girêdayiye û mirov nikare wan ji hevdû qut bike. çiqas civakbûyîn ewqes parastin, çiqas parastin ewqas hebûna civak bi hêz dibe. Rola jin jî di van herdû xalan de roleke sereke ye. Gotina ku dibêje jin jiyane ji xwe de nehatiye gotin. Jin bi tena serê xwe mîna gerdûneke ku xwedî taybetmendiyên dewlemend e. Ev çi di warê taybetmendiyên xwe yê xwezaya biyolojîk de dibe, çi di warê taybetmendiyên xwe yê hestyarî û hizrî de dibe. Ev taybetmendiyana hiştiye ku jin li hemberî jiyanê hîn zêdetir hişyar be û di aliyê parastinê de li pêş be.

### Bûyera civakbûyînê di jiyana mirovahiyê de awarteyekî dîrokî bûye

Mirovatî, ji destpêka hebûna xwe û heya roja me ya îro her di lêgerîna naskirina çavkaniya hebûna xwe de ye. Bi hezarên salan mîna zarokekî/ê ku bi her tiştî re dikene û şadibe jiyaye. Ji ber ku tevahî hebûnên li derdora xwe, mîna xwe zindî hîskiriye. Mirovatî demên xwe yên herî dijwar di avabûna xwebûyînê de ye, yanî di demê civakbûyînê de jiyan kiriye. Dayika ku civak li derdora xwe kom dikir û mîna mamosteyê ji şagirtên xwe re rêkûpêkên jiyanê yên destpêkê dida nasîn, bi hêzên xwe yên afirîner, bi ked û zehmetiyên pir mezin, civak ber bi civakbûyînê ve bir. Ger ku jiyana mirovatî hetanî roja me ya îro hatiye û dom kiriye, ew deyîndarê vê rastîyê ye. Ji ber ku bûyera civakbûyînê di jiyana mirovatî de awarteyekî dîrokî bûye.

### Civakbûyîn li ser têgihiştina jiyaneke hevpar pêk tê

Di nava şart û mercên zehmet de mirov bi civaka xwe dikarî xwe li ser piyan bihişta. Pîvanê civakbûyînê jî ger ku nebûya, wê tiştekî ku civak li gel hevdu bihişta wê nebûya. Ji ber ku civakbûyîn bi xwe pîvana têkîliya kesayet bi civakê re û ya civak bi kesayet re ye, ev yek jî li ser têgihiştina jiyaneke hevpar pêk tê. Ya ku ev pîvan bi mirov û civakê da qezenckirin jî çanda jin ya xwedawendîtiyê bû. Gelek bermahiyên ku di roja me ya îro de ketine dest, vê rastiyê îsbat dikin.

### Civakbûn taybetmendiya her mirovekî/ê ye

Jiyan mafê her kesî ye û daxwaza ku mirov bi civaka xwe re jiyan bike, di her mirovekî de heye. Ji lewma dema ku êriş li ser van daxwazan tê çêkirin, mirov dikeve rewşa xwe parastinê de. Lê pêdiviya xwe parastinê di her demê de li hemberî heman sedeman ne hatiye çêkirin. Mînak di civaka neolotîkê de mirov li hemberî şert û mercên xwezayî yê zehmet pêdiviya bi xwe parastinê didît, lewra her ku mirov dihizirî di warê parastinê de xwe pêş bixe amûrên nû diafirand. Lê mixabin heya ku mirov xweza naskir û şêwazên xweparastinê yê bi gelek rengan peyda kir, vê carê mirov li hemberî pêdiviya xweparastinê ya li hemberî hevdû dît. Ev pêdivî encamê pêşketina pergala desthilatdar ya bi hişmendiya mêr a bi rêbazên êrişkar û talankar pêş ket.

### Li hemberî xeta desthilatdariyê; civaka demoratîk

Pergala mêr ya ku li hemberî çanda dayikê pêşket her ku çû bû belaya serê mirovatiyê. Ji xwe de bindestiya jin bingehê hemû bindestiyan ne. Ger mirov pergala desthilatdar ya pênc hezar salan lêkolîn bike wê bibînin ku çawa bindestî di şexsê jinê de her ku çû kûr bû û ev bindestî bû rewşa tevayî civakan. Dîrok bi şerên van her dû xetan,



xeta desthilatdarî û xeta civaka demokratîk heya roja me ya îro hatiye. Herwiha li hemberî şertên xwezayê hêza civakbûyînê li gel mirov bûye sedemê xweparastinê û serkeftinê, li hemberî êrişên desthilatdar jî civakên ku xwe sipartine hêza xwe ya cewherî û bi yekbûyîna xwe ya civakî sekinîne karîbûne xwe li hemberî êrişan biparêzin û azad jiyan bikin.

### Hêza zanebûn û têgihiştina azadiyê di xwebirêxistinkirina civakan de ye

Civakên ku bi êrişên desthilatdaran û polîtîkayên wan perçebûne, ev civakana mehkûmê tinekirinê, belavkirin, hilandin û xwe jibîrkirinê bûne. Li hemberî êrişên desthilatdara û fêlbaziyên wan berxwedaniyên civakan çêbibin jî, lê rastiya dîroka vê pergalê tecrûbeyeke da civakan ku êdî her civak dizane ku berxwedanî û xweparastin tenê bi hêza fîzîkî têrê nakê, ji xwe ev di tu deman de jî nebûye bingehê serkeftinê. Hêza zanebûn û têgihiştina azadiyê ew hêzeke bingehe di xwebirêxistinkirina civakan de ye. Xwerêxistinkirineke bizanebûn bingehê serkeftin û azadiya wê civakê ye. Her civakeke li gorî şert û mercên demê pêwîstiya xwe ya guhertin û veghertinê heye.

### Civakên li du doza azadiyê ne pêwîst e xwe birêxistin bikin

Pergala desthilatdar her dem ji bo ku desthilatdariya xwe bi hêz bike, xwe di gelek forman re derbas kiriye, her demekê bi formeke nû, bi rêbaz û taktîkên cûda ji bo ku serweriya xwe li ser civakan ava bike, di nava tîkoşînekê de bûye. Foram niha jî ya ku ev pergal li ser wê jiyan dike, forma moderníteya kapîtalîste ya ku bi pêşkêşkirina modêla dewlet-netew dixwaze ku tevayî civakan serwer bike. Ji lewma civakên ku bi du doza xwe ya azadiyê de ne pêwîst e ku li hemberî vê yekê bi enternatîfên xwirt xwe bi rêve bive, hebûna xwe biparêze û hêza xwe bi rêxistin bike.

### Wê jiyana azad bi avakirina pergaleke demokratîk pêk bê

Yek ji sedemên ku îro Rojhilata Navîn di nava qeyranê de jiyan dike, sedemên neguhertina hişmendiyê bû. Ev hişmendiya ku di bin bandora hin qalibên weke olî, mezhebî û zayendî de jiyan dike û ji ber ku van qalibên xwe derbas nake û şoreşeke di warê fikrî de pêş naxe. Ev bûye zemîneke ku hêzên desthilatdar xwe li ser ava bike. Lê êdî dem hatiye ku gelên Rojhilata Navîn ji sedemên ku ew paşde dikşîne û nahêle ku bibe xwedî jiyaneke azad, jiyana azad jî encex bi avakirina pergaleke demokratîk pêk bê. Ji bo avakirina pergaleke demokratîk pêdiviya naskirina pirsgirêk, analîzkirin û çareserkirina wan bi perspektîfeke nû heye. Ev perspektîf ji aliyê Rêber Apo de pir berfireh hatiye danîn, lê yê ku vê perspektîfê bi tevayî gelan bide pêkanîn, rola vê ya piratîkî jî dikeve ser milê civaka kurd û em dibînin ku îro civaka kurd bi vê rolê radibe.

### Azadiya civakî dibe azadiya netewî jî

Sedemê ku civaka kurd jî bi vê rolê radibe ew e civaka kurd ji civakên destpêkê yê ku li ser van axa jiyan kiriye. Herwiha civaka ku bi her gelekî re danûstend kiriye, çanda neolotîkê bi xwe li ser civakan belav kiriye. Civaka kurd jî civakeke ku bi salan ji mirovatiyê re dergûşî kiriye, li gel ku ji civakên destpêkê yê ku li ser axa Mezopotamyayê jiyan kiriye. Di heman demê de ji civakên ku herî zêde bi çanda jin xwedî bûye û ji civakên ku herî zêde li hemberî êrişên desthilatdar rû bi rû hatiye. Bi salan hatiye bindestkirin, bi gelek komkujiyan re rû bi rû maye, gelek caran serî hilda be jî, bi binkeftinên tirajedîk bi encam bûye. Hêza civakbûyîn di kurda ew li ser piya hiştiye. Azadiya civakî dibe azadiya netewî jî. Îro em dibînin ku civaka gelê kurd ji civakên herî zêde yê ku jin tê de di nava tîkoşînê de bi awayeke çalak cihê xwe digrin.

### Civakeke azad bi jina azad pêkan e

Îro roj li Bakur û Rojhilatê Sûriyê sîstema Xweseriya Demokratîk pêş dikeve. Bingeh û derfetên çareseriya xweseriya demokratîk jî her ku diçe ji bo pirsgirêka tevahî Rojhilata Navîn modeleke çareseriyê derxistiye holê. Sedemên pêşketina xweseriya demokratîk ew e ku mîna hizirên desthilatdar nahizirin, jin paşguh nakin û her pêkhateyekî bi maf dike. Pergala mêr ya desthilatdar herdem ji bo kolekirina civakan gotine destpêkê li jin bixin. Lê têkoşîna ku bi felsefeya Rêber Apo pêşktet, li hemberî vê ferasetê dibêje; ji bo civakeke azad û demokratîk, destpêkê pêwîst e ku jin xwe bi hêz bikin û tevayî jinan rakin ser piyan. Li Rojava ji bo parastina nirxê civakê, azadiya gel û jinê înşakirina pergala demokratîk di qada parastinê de jî bi çalak dibe.

### Hêza mezin hêza civakê ye

Dema li Rojava amadekariyên pergala xweseriya demokratîk dihatin kirin gelek kesan digot dê çawa çêbibe? Wan kesan civak bêhêz didîtin, civakê qels didîtin. Li gorî wan divê her tim desthilatdariyeke li ser civakê hebe. Ev jî encama zîhniyeteke ku bi sedan sal in tê meşandin e. Lê civak xwedî hêzeke wisa ye ku ev hişmendî jî guhert. Yanî dema civak biryarê bide, avakirinê pêk tîne û hêza mezin hêza civakê ye. Li Rojava civak li gorî pêwîstiyên xwe biryarê dide. Civak bi xwe pirsgirêkên xwe çareser dike. Li Rojava hêza civakê ya veşartî îro pir eşkere derketiye holê. Her beşeke civakê li gorî taybetmendiyan xwe xwe bi rêxistin dike. Têkoşîn, ked û bidestxistina encamê her tim moralê dide civakê. Serkeftina niha li Rojava hatiye bidestxistin moraleke pir mezin daye hemû civakê. Pergala xweseriya demokratîk li ser hîmên neteweya demokratîk bi pêş dikeve.



# Çareserkirina pirsgirêka gelê Kurd çareserkirina pirsgirêka Sûriyê ye

Partiyên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê diyar kirin ku Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê xewin û xeyalên gelê Kurd ya bi sala ne, ev jî bi saya banga "Aştî û Civaka Demokratîk" ya Rêber Abdullah Ocalan pêk hat û wê bibe bingeha parastina destkeftiyên Şoreşa Rojava û her çar perçeyên Kurdistanê.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Bi sedan sal in gelê Kurd ji bo ku li ser axa xwe, bi ziman, nasname û çanda xwe azad bijî, têkoşiya ye û gelek berdêl dane. Ji bo doza Kurd û Kurdistanê di nav Kurdan de gelek pêşeng derketine ku li dijî serdest û dagîrkeran mafê gelê xwe biparêzin. Axa Kurdistanê ji dîrokê ve heya roja me ya îro, rastî gelek şer û serhildanan re rû bi rû maye. Her çiqasî axa Kurdistanê bi darê zorê hatibin desteserkirin jî lê gelê Kurd li dijî neheqî û zilmê her tim netewe û axa xwe parastiye û serî hilda ye.

Bi vê armancê Rêber Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî ji bo bidestxisina mafê gelê Kurd, Tevgera Karkerê Kurdistanê Pkk`ê ava kir û dest bi têkoşînê kir. Encamê kar û xebata sala ya tevgerê şoreşa 19`ê Tîrmehê riya azadiyê misoger û ronî kir. Şoreşa Rojava ji bo gelê Kurd bû derfeta zêrîn ya bidestxistina mafê wê. Ji bo ku gelê Kurd destkeftiyên Şoreşê biparêzin û xeyalên şehîdan pêk bînin, yekîtiya gelê Kurd girîn û pêwîst dîtin. Lewra banga "Aştî û Civaka Demokratîk" ya Rêber Abdullah Ocalan ji bo yekîtiyê bingeh dîtin. Li ser vê bangê partiyên Kurdî 26`ê Nîsanê bi tevlîbûna zêdetirî 400 kesan ku ji Rojava, Başûr û Bakurê Kurdistanê, herwiha kesayetên derve jî "Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê" li bajarê Qamişlo li dar xistin.

Derbarê mijarê de Hevseroka Partiya Guhertina Demokratî Kurdsitan Mizgîn Zêdan û Sekretêrê Giştî Yê Partiya Demokaratîk A Kurdistana Sûriyê Ciwan Ebdulkerîm Siko, ji rojnameya me re axivîn.

### `Wê konferans encama kar û xebata bi salan biparêze`

Hevseroka Partiya Guhertina Demokratîk a Kurdsitan Mizgîn Zêdan wiha axivî: "Wek xewin û xelê her Kurdekî bû ku li Rojavayê Kurdistnê partiyên her çar perçeyên Kurdistanê li ser maseyekê ji bo yekêtiyê, li hev bicivin. Lewra ji bo parastina mafê gelê Kurd di rewşeke wiha hestiyar de ya herî girîng û pêwîst, yekhelwesta û yekrêziya Kurdî ye. Herwiha ev yek dikeve xizmete dîroka gelê Kurd, çimkî lidarxistine vê konfransên, wê hîn bêtir gelê Kurd li cîhanê bibin bi nav û deng bike û wê ji tevayîya cîhanê re bide nîşandan ku ev gel xwedî ziman, çand û nasnameyeke dîrokî ye."

Mizgîn Zêdan balkişan ser bandora konfransê ji bo demê pêş de û wiha got: "Bê goman wê di demên pêş de "Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê" bibe bingeha konferansa neteweyî ya li ser asta her çar perçeyên Kurdistanê. Ji ber ku yekîtiya Kurdî wê hêzê bide tevgere û doza gelê Kurd. Herwiha wê ev yek ji aliyê dewletên navneteweyî ve jî were pejrandin. Lewra wê partiyên Kurdî bi kar û xebatên xwe dîroka gelê Kurd ji cîhanê re tekez bikin û wê deskeftiyên ku gelê Kurd yê bi salan bi dest xistî, biparêzin."

### `Wê banga Rêber Apo bibe bingeha azadkirina gel`

Mizgîn diyar kir ku banga "Aştî û Civaka Demokratîk" ya Rêber Abdullah Ocalan bi lidarxistina konferansê, bi cih hat. Mizagîn axaftina xwe wiha domand: "Banga Rêber Apo ya ji bo civakek azad û demoratîk, bandoreke erênî li ser hemû parityên siyasî yên Kurdî kir. Lewra hişt ku her kes li xwe veger û ji bo berjewendiyê gelê Kurd bibe alîkar."

### `Em dibin yek da ku neçin yek bi yek`

Li ser çareserkirina pirsgirêka gelê Kurd li Sûriyê jî, Mizgîn Zêdan destnîşankir ku çareserkirina pirsgirêkên heyî yên li Sûriyê, bi çareserkirina pirsgirêkên gelê Kurd ve girêdayî ye. Mizgîna axaftina xwe domand: "Ji bo ku her pêkhateyek ku li Sûriyê dijî bigihêje mafê xwe û bi ziman û çanda civaka xwe bijî, divê Sûriyeke nenavendî were avakirin. Pirsgirêka pêkhateyên kêm yên li Sûriyê, incex bi gûftigoyeke bi hemû nûnerên partiyên Sûriyê giştî re, were çareserkirin. Ez dikarim vê yekê bêjim ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pirsgirêka pêkhateyan re bi her re nîne. Lewra ji despêka şoreşê û heta roja îro hemû pêkhateyên heyî bi ziman, çand û kevneşopiyên civaka xwe re bi serbestî dijîn. Divê li seranserê Sûriyê ev yeke pêk were. Çimkî ji mafê her gelî ye li çanda xwe xwedî derkeve."



Mizgîn Zêdan



Ciwan Ebdulkerîn Siko

Hevseroka Partiya Guhertina Demokratî Kurdsitan Mizgîn Zêdan wiha axaftina xwe bidawî kir: "Hêviyên me ew e ku di demên pêş de têkilyên me partiyan bi hevre, zêdetir bibe. Da ku em pirsgirêka gelê Sûriyê bi giştî û yê gelê Kurd bi taybet, çareser bikin. Bila em bibin yek da ku neçin yek bi yek, mîna ku seydayê Cegerxwîn aniye ziman."

### `Lidarxistina konferansê yê nava gel de rehetiyek da avakirin`

Li ser heman mijarê Sekretêrê Giştî Partiya Demokaratîk Kurdistanê li Sûriyê Ciwan Ebdulkerîm Siko jî sipasiya tevayîya partiyên ku tevlî konfransê bibûn kir û diyar kir ku, ev konfraans bûye hêviya gelê Kurd da ku karibin li ser axa xwe azad bijîn û wiha axaftina xwe domand: "Yekîtî û yekhelwesta gelê Kurd wê çand û nasnameya gel di Sûriya nû de, misoger bike. Lidarxistina konfransê rehetiyek di nava gel de da avakirin, lewra di demeke wiha de ku mirov dikare bêje nexşeyeke nû di rohilata navî de çêdibe, yekîtiya gelê ku bi salan e li ber xwe daye, pir girîng e."

### `Divê jin di Sûriya nû de xwedî ciheke taybet be`

Ciwan Siko wiha axaftina xwe berdewam kir: "Jixwe her kes vê yekê dizane ku armanca lidaristina konfransê, avakirina şandeyeke hevbeş e. Da ku bi navê gelê Kurd hevdîtin û goftûgoyan bi hikumeta Şamê ya nû re bike. Ji ber ku li Sûriyê gelek pêkhate hene, nabe ku gelê pêkhateyekê ji bo bi aşitî bijî, çanda xwe wenda bike. Dive di Sûriya nû de her pêkhate bi nasname û çanda xwe azad bijî. Herwiha divê rola jin hîn bêtir were pêşxistin, lewra rola jinê di hemû qadên jiyanê de pêwîst û girîng e. Ji ber ku jin dayîka şehîd e, hevjîna şehîd e û mamosteya nifşên nû ya civakê ye."

Li ser kirîza Sûriya ku zêdetirî 13`e sal in dewam dike û hilweşandina rejîma Eseed, Ciwan Ebdulkerîm Siko wiha axivî: "Ji ber encama kirîza Sûriya ya ku bi salan dom kir, bê goman bandoreke neyînî li ser gelê Sûriyê bi tevayî kir. Ji kuştin, wêrankirin, koçberkirin û wendakirina mirovan êdî bûye dema ku gel bi aşitî û azadî bijîn. Lê weke tê payîn ku desthiladara nû ya Şamê jî, bi lidarxistina konferans û derxistina destûrê, pêkhateyên kêm, di Sûriyê de bê par bihêle. Lewra biryarên destûra ku em tê de ne amade bin, em ê îtîrafê pê nekin. Ji ber ku yê herî zêde ji bo parastina xaka Sûriyê li ber xwe daye û têkoşîn kiriye, gelê Kurd e, ti kes nikare vê heqîqetê înkar bike."

### `Ti hêz nema dikare hebûna gelê Kurd tune bike`

Sekretêrê Giştî Partiya Demokaratîk a Kurdistanê li Sûriyê Ciwan Ebdulkerîm Siko li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan axaftina xwe wiha bidawî kir: "Piştî zêdetirî 40 salî ji kar û xebatê tevgera pkk`ê ku berdelên herî biha ji bo doz û berjewendiyê gelê Kurd li hember siyaseta dewleta Tirik ya dagîrkerî, kirî êdî ti kes nema dikara hebûna gel tune bike. Dewleta Tirk jî êdî gihiştiye vê baweriyê. Lewra banga Rêber Apo mîna çareserkirina pirsgirêka gelê Kurd girîng dîtin. Ji bo vê yekê jî em spasiya Rêber Apo dikin ku wê bi saya banga "Aştî û Civaka Demokratîk" yekîtiya gelê Kurd di demek nêz de were çêkirin. Herwiha em spasiya hikumeta Başûrê Kurdidstanê dikin ku ew jî ji bo yekhelwesta Kurdî bûne alîkar."



# 'Banga Aşitî û Civaka Demokratîk banga ronahiya mirovbûnê ye'

Rêveberê Insiyatîfa Sûrî a Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir diyar kir ku banga Rêber Apo ya 'Aştî û Civaka Demokratîk' banga ronahiya mirovbûnê ye û wiha got: "Banga Rêber Apo çareseriya hemû aloziyên gelan e û rêya wekhevî û biratiyê ye."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Banga dîrokî a Rêber Apo a bi navê aştî û civaka demokratîk ku di 27'ê Sibatê de hat raghandin, li tevahî cîhanê deng veda û tevahî aliyên kurdî piştgirya xwe jê re ragihandin, lê dewleta Tirk heta niha tu gavên berbiçav neavêtine.

Derbarê pêşveçûnên banga Rêber Apo Rêveberê Insiyatîfa Sûrî a azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende munzir ji rojnameya me re axivî.



**'Banga Rêber Apo banga aştî û civaka demokratîk e'**

Ferzende Munzir destnîşan kir ku banga Rêber Apo bangeke dîrokî ye û wiha got: "Banga Rêber Apo a bi navê aştî û civaka demokratîk bangeke dîrokî bû, ev bang weke destpêka çareseriyê ji pirsgirêka hemû gelan e û bi taybet gelê kurd re ye. Pirsgirêka kurd bi rê û rêbazên nû bi rêbazên herî demokratîk, aştî û şaristanî ku hemû gel li hêviya wê bûn, tevahî cîhan li benda vî bangî bûn ku pêk were. Cara yekemîn e ku Neteweyên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropayê, hêzên cîhanê, Çîn, Rûsya, Fransa, Almanya, Brîtanya, dewletên Rojhilata Navîn û tevahî kurd bi awayekî erênî li vê bangê dinêrin. Ev banga wê li pêşiya gelek felaketan bigire, wê bibe riya ronî û azadiyê ji bo tevahî gelan."

**'Helwesta tevahî kurdan ji bo bangê bû yek'**

Munzir diyar kir ku helwesta tevahî kurdan bû yek, ev diyar dike ku piştgiriya banga Rêber Apo dikin û wiha domand: "Divê gava yekemîn ya dewleta Tirk ku Rêber Apo ji zindanê derbixin û bikin malekê ku wê demê rêbertî bikarîbe bi gelê xwe re, Dem Partî re, civakê, partiyên siyasî û hêzên leşkerî re danûstandin bike û hemû pirsgirêkan çare bike. Bi hezaran girtî di zindana de hene, di zindanê de dimînin heya ku jiyana xwe ji dest didin, ev hemû derveyî zagonên Neteweyên Yekbûyî û Ewropa ne divê em zagon bên guhertin. Şandeyên ku biçin gel Rêber Apo yek ji wan Serii Sureye Onder bû ew ji nişkê ve nexweş dikeve û heya niha rewşa wî ne diyare, em keda wî ji bo çareseriyê pîroz dibînin."

**'Rêber Apo çareseriya doza tevahî gelan e'**

Ferzende anî ziman ku ji bo çareseriya vê dozê du alî hene û wiha got: "Ji bo çareseriya vî dozî di alî hene gelê kurde û pêşengiya rêber Apo ya ku berpisyariya vê dozî bi gîştî hildaye ser milê xwe û nexeşrê jî dîna ye divî ji aliyî gelê kurd û hevalên serok ve hîn piştgirî hebe, pêwîst e dewleta Tirk bi cesaret edî gav bavêjê divê vî dozê qebûl bike û girtiyên nexweş yê ku bûye 30 sal di zindan de ne derkevin, destûrê xwe bughere ji bo her partîyekî siyasî karibe xebatên xwe yên siyasî bikin û ya herî girîng baweriyê bi gelê kurd û doza gelê kurd bike. Rojhilata navîn piştî 7 cotmehê êrîş Xeza û Hemas edî Rojhilata Navîn ne weke berê ye edî nexşeya sed salî derbas dibê, ji bo vê nexşeyek û pirojeyek nû heye. "

**'Banga aştî banga azadiya Rêber Apo ye'**

Rêveberê Insiyatîfa Sûrî ya azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende munzir di dawiya axaftina xwe de bang li tevahî cîhanê kir û wiha got: "Bang ji bo Neteweyên Yekbûyî, Enqere û tevahî hêzên navdewletî xwedî li vê bangê dîrokî derkevin û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo di heman demê de hemû girtiyan azad bikin. Di vê dema dawî de erdhej li Sutanbolê çêbû û ew heya li girava Mermera ev jî ji deryaya Îmral yê ve nêze, ev jî metirsiyeke li ser Rêber Apo ji ber vê banga me ji tevahî cîhanê re ku bilez tevbigerin ku cihê rêbertî bugherin. "



## Di pêvajoya dudan de, "Yekîtiya Netewî" pêk hat!

**Ahmet Aktaş**

Di Pêvajoya Yekê de, Rêber APO peyamek şand Newroza 2013'an a Amedê û di çarçova vê peyamê de li Rojava Şoreş pêk hat.

Di Pêvajoya Dudan de, em dibînin dîsa Rêber APO peyamekê dişîne û di çarçova vê peyamê de dîsa li Rojava(26'ê Nîsana 2025'an) Konferansa Yekrêzî û Yekhilwesta Netewî pêk hat.

Di heman rojan de, ji bo yekrêziya Rojhılat jî Konferansek hêja hat lidarxistin.

Ma gelo van pêşvehatinan, van bûyerên giring, hema jiber xwe ve pêktên û hema ji nişkave, bêyî amadekariyên giring û mezin derdikevin holê?

Na xêr!

Ev pêşkeftinên giring û watedar, van mitîng û civînên xwedî mijarên dîrokî, di encama serêşên mezin ên Rêber APO û hewldanên canbexşane ên Tevgêra Azadiyê û gelê Kurdistanê de tên afirandin.

Jixwe hîn di pêvajoya yekê de, gelek partî, rêxistin û kesan, gotin û hilwestên pir xerab, bêûjdan û bêexlaq nîşan dan.

Lê eha bi şênberî li ber çavê raya giştî cîhanê ye, ku Şoreşek wisa pêkhat û di nava dozde salan de, xwe gihand encamên pir bi rûmet û her wiha ji aliyê Rojhilata Navîn û cîhanê ve, bi rêzdarî tê pesinandin û pejirandin.

Bêgûman ev teqdîr û razîbûna raya giştî cîhanê, ji cewherê hêja yê naveroka vê şoreşî tê; ji nezerî û kiryarê wê tê, ji pêşengiya jinê û ciwanan a vê şoreşê tê. Bi gotinek din, ji cewherê felsefe, bîrdozî, zihniyet û hilwesta Rebêr APO tê.

Ji bo Pêvejoya Dudan, dijberî û bangeşiyên xerab, li goreyî Pêvajoya Yekê pir kêm in, heta mirov dikare bêje, ji bilî Hakan Fidan û hevalê wî Mihemmed Colanî, yên berê dujminantî dikirin jî, vê carê piştgriyên xwe nîşan dan.

Ev tê wateya ku, him zemîn û him şensê serkeftina vê Pêvajoya Dûdan, ji ya berê zêdetir e.

Erê dîsa xeter hene; kelem, asteng, xêrnexwaz hene û wê hebîn, lê derfetên vê carê pirtirin ji yên berê.

Li aliyê din, bandora berfireh a giring û dîrokî ya deskeftiyên van pêvajoyan divê zelaltir werin zanîn.

Çawa di serketina şoreşê de para parçeyen din hebûn, nuha jî çawa di serkeftina Konferansa Yekrêzî û Yekhilwestiya Kurdî de para wan parçeyan hene, her wiha bandora erênî ya serkeftina van pêvajoyan jî, li ser hemû perçeyan û dostên gelê Kurdistanê ewqas heye.

Her çendîn saziya KNKê ya sîwana yekitiya netewi ya bi rûmet a gelê Kurdistanê heye û di kombûna vê Konferansê de pir hewldan jî kiribe, nuha encama vê Konferansa hêja, wê zemînê berfirehtirkirina KNKê jî xurtir bike.

Kurt kurmancî, ji nuha û pêve, van cûre pêşhatin ên di asta netewî de, wê hevdû himbêz bikin û hevdû xurtir bikin.

Her wiha konjoktora herêmî û cîhanê, êdî di Rojhilata Navîn de weke aktor, Israilê û Kurdistanê derdixin pêş.

Ew aktoriya Receb Erdoganê ku xwe cîgirê Bush, ê Projeya Mezin a Rojhilata Navîn didît, êdî çû sergoyê dîrokê.

Her wiha Îran jî ketiye devê tivinga Trump, heke Îran, êdî dev ji wê hovîtiya xwe ya ku keç û xortên Kurdistanî lidar dixin, bernede û hişê xwe nede serê xwe, li nêz aqûbeta Seddam tê serê wan.

# Reşkujiya li serê gelê Ermen

**Volqan Elî**

Ji bo ku naveroka hin karesatên wisa were fêmkirin û heqîqat ronî bibe, hewce ye mirov li serdemên derbasbûyî vegere.

Di sed sala 19. û bi taybet jî ber bi dawiya sed salê ve êdî împaratoriya Osmanî hatibû li ber sikratê. Ji ber vê yekê ji aliyê dewletên emperyalîst ên demê ve wekî 'Zilamê Nexweş' dihate dîtin. Wan ne ji bo ku vî zilamî sax bikin, ji bo qetqetî û parçe parçe bikin û daqurtînin ev nav li 'Zilamê Nexweş' kiribûn. Di demek ku 'mêrê pîr' ji derdê sikratê dinalî de, gelên wekî Ermen, Ereb, Kurd jî, ku di binê nîrê Osmanî de bûn, dest pê kiribûn li çarenûsa xwe dipirsin. Di vê çarçoveyê de; di çaryeka dawî ya vê sed salê de Konferansek Ermenan çêbû. Dibe ku li vê civînê gelek tişt hatibe nîqaşkirin. Lê cewhera vê, rewşa gelê Ermen û împaratoriya Osmanî ku wekî Zilamê Nexweş dihate binavkirin. Werhasil ji vê dîrokê pê de gelê Ermen dest pê kir rewşa xwe ya neteweyî lê bipirse. Mercên serbestî û azadiyê lê bikole, di astekê de ji aliyê hin rewşenbîran ve be jî têkoşîna vê bimeşîne.

Lê li aliyê din hêzên emperyalîst jî vala nedisekinîn. Mînak, împaratoriya Almanyayê ku hêzeke girîng a emperyalîst a wê demê bû, wekî tifaqa herî girîng împaratoriya Osmanî hilbijartibû. Diviyabû li rojhilat ev împaratorî saxlem bimana ku berjewendiyên wan misoger bûna û bihatana parastin. Jixwe hêzên emperyalîst timî li Rojhilata Navîn ajan û amîlên di bin navê 'mîsyoner' de dihewandin. Mînak, Almanya bi xwe di serê 1800'an de subayekî xwe yê bi navê Moltke erkdar kiribû. Karê wî yê esasî modernîzekirina artêşa Osmanî bû. Dîsa di çaryeka dawî ya sed sala 19. De jî navê misyoner-subayê Alman ku di nava erdên Osmanî de kar dikir jî, 'Göls' bû.

Ji ber ku mijara me ne dîrok e û vê derê jî ne kursiyê dîrokê yê zangehekê ye, em lêborîna xwe ji xwendekaran dixwazin lê ji bo fêmkirina hin tiştan, kûr û dûr çûyin neçariyek e.

Werhasil, 'Göls' di heman demê de kesekî civaknas bûye jî. Li gorî wî ji bo ku Osmanî ji rewşa xwe ya 'Zilamê Nexweş' derkeve divê Osmanî Ermenên di nava xwe de çareser bike. Yanî bi şiklekî ji nav bibe. Dîsa heman kesê bê yom di dîrokek ewqas zû de ji bo Dêrsimê dibêje 'Dêrsim pirsgirêk e divê hûn Dêrsimê jî çareser bikin".

Piştî bi dehan sal ji planên 'Göls'ê Alman, pêşengên Îttihat ve Terakî Enver, Talat û Cemal paşe dibin dildarên û alîgirên împaratoriya Almanyayê. Ev, ji ber tiştê li jorî hatiye ziman diyar e ne tesadufek e. Di serê sed sala bîstan de partiya Îttihat ve Terakî ya pêşengiya Enver, Talat û Cemal paşe bi temamî rêveberiya împaratoriya Osmanî xistiye destê xwe.

Dema welê dibe, ne yekser roja planên 'Gölsê' Alman bilind dibe. Ruhê planên 'Göls' ew e; Osmanî nikare erdên xwe yên pir mezin biparêze. Eger bixwazibe xwe biparêze divê dewleteke biçûk ava bike. Ji erdên mezin dest berde. Anatoliyê ji xwe re esas bigire. Lê li vê derê jî Tirkan bike qewmê zêde. Di serî de Ermenan ji holê rake. Yên din jî bi şiklekî çareser bike. Îttihad ve Terakiya Enver, Talat û Cemal paşe vê perspektîfa împaratoriya Alman ji xwe re digire. Îttihad ve Terakî li ser vê esasî di navbera xwe da karbeşiyekê dike: Enver paşe ji bo Kurdan, Talat paşe ji bo Ermanan, Cemal paşe ji bo Eraban deriyên dojehê vedikin.

Dema em behsa vê plana Almanya emperyalîst dikin, ji ber ku erdên pir berfireh ên Osmanî ji wan re dimîne mînak Îngîlîz û Fransî ji vê planê re bê deng dimînin. Heta veşartî, jê re dibin alîkar. Ermen û Kurd û Ereban ji bo ku serî rakin û werin qetlkirin timî tehrîk dikin.

Wekî encam, qaşo ji vê planê herî bi kêm zerer Ereb derdikevin. Lê bi dehan rewşenbîrên pêşeng bi talîmata Cemal paşe, tên îdamkirin. Kurd bi komplo û qetlîamên Enver paşe, li 'Sarikamişê' bi dehezaran ciwanên xwe şehîd didin. Dîsa talîmata Enver paşe, heft sed hezar Kurdî ji Kurdistanê di mercên ne destdayî de ber bi rojavayê Anatoliyê dike koçber. Hemû bi rê de jiyana xwe ji dest didin. Jixwe armanc jî ev e. Karesata herî mezin bi serê gelê Ermen de tê. Hê ji beriya ku şerê cîhanê yê yekemîn dest pê bike Planên xwînxwar ên Talat paşe dikevin meriyetê. Di demeke kurt de hê beriya şerê cîhanê yê yekemîn li Klîkya-Edene nêzî sih hezar û li Kurdistanê (Sason) jî 300 hezar Ermen tê qetlkirin. Dîsa di bin berpirsiyariya Talatpaşeyê xwînxwar de bi destê Alayên Hamidiye zêdetirî 1,5 milyon Ermen di dema şerê cîhanê yê yekemîn de bi bahaneya mişaxtîkirinê tê qetlkirin.

Di dawiya şerê cîhanê yê yekemîn de gelên Aşûrî-Suryan, Ereb, Ermen, Kurd zererên wisa yên mezin dibînin. Lê zererên Ermenan dîtî bê tarîf in, tarîf yan jî rawekirina wê nabe. Gelek li welatê xwe, ne tenê hatiye mişaxtîkirin û bûye penaber kokên wî hatiye qelandin. Ermenan ji ber vê yekê ji vê rojê re gotine; 'METZÎEN' Na, mirov zêde heqê hêzên emperyalîst û planên wan jî, nexwe; ji bo ku ber dilê wan xweş bikin, ruxmî ku li Kurdistan, Klîkya-Edene û Anatoliyê kokên wan dane qelandin li jorî Serheda jorîn Ermenîstaneke hişk û ziwa û bê berhem ji Ermenan re dane avakirin.




# Mafê Hêviyê çi ye?

Mafê hêviyê têgehek zagonî ye ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrpayê di 1977'an de derxist. Di serdema niha de jî piştî 26 sal ji tecrîda li ser Rêber Apo, di warê pêkanîna mafê mirovan de, mafê hêviyê ji bo wî mercekî girîng û tekûz e.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Mafê Hêvîyê çi ye û kengî derket? Wateya mafê hêviyê di pênaseya xwe ya giştî de, amaje dike ku dema kesayetek di girtîgehê de be û azadiya xwe winda kiribe, tevî ku salên hukim lê hatibe birîn an jî hukim mayînde li ser hatibe ferzkirin, dikare hêvîya xwe, xewn û xeyalên xwe winda neke. Herwiha ev têgeh di naveroka xwe de destnîşan dike ku eger hukim li ser girtiyekî/ê hatibe kirin, divê hukim li ser esasê arastkirin û serastkirina çareseriyê bê kirin û piştî demekê derfetek ji bo wî/wê were dayîn. Ev yek jî li gorî yasaya û nirxên mirovahiyê dide tekezkirin ku mirov dikare were guhertin û şaştiya xwe rast bike eger sûcekî mezin li dijî pîvanên mirovahiyê kiribe û bi dilsozî pirsgirêkê çareser bike di şertûmercên zagonî de. Ev têgeh yekm car Dadgeha Ewropayê ya Mafê Mirovan di sala 1950'î de derxist, bi wateya ku maf ji bo kesên girtî yên ku hukmê mayînde li wan hatibe birîn, tê dayîn piştî ku demeke destnîşankirî ew kes azad bibe, ev dem jî ji welatekî cudatir e ji welatekî din. Herwiha yekem car mafê hêviyê sala 1977'an di dadgeha destûrî ya Elmaniyê de hat pêkanîn.



**Girîngiya mafê hêviyê**

Mafê hêviyê yasayekî girîng e ji bo kesên dîlgirtî, nexasim kesên ku di bin sûcên azadî û wekheviyê de ji bo civakê hatibin girtin û cezakirin. Bi kesên wiha civak dike ve qonaxên serdemên tarî, dîrok û tişta ku hêzên serdest bi serê civakê aniye, şahidê vê yekê ye. Ji van kiriyaran girtina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e ku di encama Komployeke Navnetewyî de ji hêla hêzên hegemona cîhanî bi serkêşiya dewleta Tirk ve hate girtin û ev zêdeyî 26 salan e ku dibin tecrîdê de dijî.

**Biriyarên navnetewî yên dijî tecrîdê**

Di sala 2004'an de, ceza ya mirinê di derheqê Rêber Apo de ya hatibû birîn, rabû. Ji bo vê cezayê hat dayîn cezaya giran a jiyana tevlihev. Li gorî maddeya fermî ya 2'yan a Zangona Sûcdaran a Tirkiyê, hukmê girtina mayinde li Rêber Apo hat birîn. Ev hukim ji aliyê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropî (ECHR) ve wek biriyareke dijî nirxên mirovahiyê hate naskirin. Heman dadgehê diyar dike ku hukmê girtinê heya dawiya jiyanê li Rêber Apo bêyî ku mafê danûstandin û azadiyê bibîne, sûcekî derzagonî ye. Di sala 2014'an Dadgeha Ewropayê ya Mafê Mirovan de li ser girtina Rêber Abdullah Ocalan, got ku cezaya ku di şexsê Rêber Apo de hat birîn, biriyareke dijmirovî ye celebeke neinsanî ye. Berî vê biryarê, di biryarekê din ya dadgehê ya 9'ê Tîrmeha 2013'an de ji Vinter Netewên Yekbûyî diyar kir ku divê mafê hêviyê hebe û cezaya girtina heya dawiya jiyanê were guherandin, da ku herî zêde piştî 25'an Rêber Apo were azadkirin.

**Mafê hêviyê, mafekî rewa ye ji bo Rêber Apo**

Doza ramanvan û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi doza siyasî ve derdikeve derdora sinorên cografîyê û digihêje pirsên girîng ên azadî, dad û mafê mirovî li dijwarî. Ji sala 1999'an ve heta niha, ew girtîgehê Imraliyê ye. Sedem jî ew e ku Abdullah Ocelan doza azadiya gelê kurd û hemû civakên bindest kiriye. Ji ber vê sedemê jî ew têkoşîneke ku di nav şertûmercên dijwar ên dijmirovî de dijî û piştî 26 salên girtina wî, ruxmî banga Aştî û Demokrasiyê jî ya ku Rêber Apo kir, dewleta Tirk mafê hêviyê nade wî û hezarên girtiyên siyasî yên Bakurê Kurdistanê ku azad bibin. Girêdana Rêber Abdullah Ocalan bi mafê hêvîyê ve girêdaneke ku dest jê nayê berdan. Herwiha li gorî zagonên navdewletî yên mafê mirovan, divê mafê hêviyê ji bo wî were dayîn.

# Emerîka, Îran û dosya nuklerî

**Zana Roj/ Qamişlo**

**Gotûbêjên fermî yên di navbera Tehran û Washingtonê de di meha Nîsanê de 3 caran pêk hatin. Herdu aliyan ew wekî erênî û avaker bi nav kirin, da ku bernameya nuklerî a pêşketî ya Îranê çareser bikin.**

Gotûbêjên fermî yên di navbera Tehran û Washingtonê de roja Şemiyê 12'ê heyvê li Muscat a Omanê dest pê kirin .Danûstandin bi navbeynkariya (wesîle/waste) Omanê û beşdarbûna Wezîrê Derve yê Îranê Ebas Eraqçî û nûnerê Amerîkî Steve Witkoff hatin lidarxistin. Di nav gefên leşkerî yên Donald Trump de eger lihevkirin bi ser nekevin, Di demekê de ku Îran daxwaza sivikkirina cezayan dike, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, di nav aloziyên herêmî yên ji sala 2023'an vir ve de, daxwaza sînordarkirinên li ser bernameya wê ya nuklerî dike.

Ev lihevkirin bi armanca gihîştina rêkeftinekê derbarê bernameya nuklerî ya Îranê ya bilez de pêk hat. Her wiha Serokê Amerîkayê Donald Trump gef xwar ku heke danûstandin bi ser nekevin, ew ê dest bi êrîşa leşkerî bikin.

Wezîrê Derve yê Îranê Ebas Eraqçî di daxuyaniyeke TV yê de got ku her du alî pir nêzîkî danîna bingehek ji bo danûstandinan bûne. Lê zêde kir ku gihîştina vê bingehê di demek nêzîk de dê derî li ber nîqaşên cidî veke.

Kesên ku di rûniştinê de amede bûne

Ji aliyê Emerîka ve Steve Witkoff, nûnerê Trump li Rojhilata Navîn, û Anna Escojima, Balyoza (Sefîr) Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li Sultanatê Omanê beşdarî civînê bûn.

Ji aliyê Îranê ve jî di çûyîna Umanê de li gel Araqçî Îsmaîl Baqaî berdevkê Wezareta Karên Derve yê Umanê. Cîgirê Wezîrê Derve yê Îranê bo Karûbarên Siyasî Mecîd Text Revançî. Alîkarê Wezîrê Derve bo Karûbarên Yasayî û Navneteweyî Kazim Xerîb Abadî û danûstandkarên (Mufawidîn) payebilind di warên cezayan û pirsgirêkên noklerî de.

Ku danûstandin bi awayekî her aliyek di odeyekê cuda de pêk hat û parvekirina nêrînan bi riya Wzîrê Derve a Umanê pêk dihatin.

**Naveroka ku hatiye gutobêjkirin ji aliyê Şanderê Taybet ê Qesra Spî Steve Witkoff wiha hate nirxandin:**

Îran yek ji welatên hilbirîner ê madeya Uraniyûm a ku di çêkirina çekên Nuklerî de tê bikaranîn e. ku di demên dawiyê de lihevkirin û peymanên navnetewî yên hilberîna û dewlemendiya Uraniyom derbas dike û zêdeyî 60% derbas dike.



Li gor vê yekê Şanderê Taybet ê Qesra Spî Steve Witkoff got ku "Her rêkeftineke dîplomatîk bi Îranê re dê bi destnîşankirina hûrgiliyên verastkirina bernameyên dewlemendkirina Uranyûm û çekên nuklerî yên wî welatî ve girêdayî be".

Witkoff roja Duşemê di hevpeyvînekê de ligel Fox News got, "Ew ê bi giranî li ser verastkirina bernameya dewlemendkirinê be. Piştre di dawiyê de çek kontrol bibin. Ev yek mûşek û cûreyên wê jî ku wan hilanîne jî di nav xwe de digire."

Her wiha tekez kir ku kontirolkirina "çekdarkirinê" yên bernameya nuklerî xalek sereke di danûstandinên bi Îranê re pêk tîne. Ev mûşek û detonator (ji bo teqandina) bombeyan dihewîne". her wiha got: "Pêdivî bi wan nîne ku ji sedî 3.67 zêdetir dewlemend bikin. Ev rêjeya herî zêde ye ku di çarçoveya peymana nuklerî ya 2015'an de destûr tê dayîne, ku tê de di sala 1018'an Srokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Donald Trump vekşiyaye".

Witkov destnîşan kir ku "Di hin rewşan de, ew digihîjin ji sedî 60, û di yên din de, ji sedî 20. Ev rêje ji ya ku ji bo bernameyeke nuklerî ya sivîl pêwîst e; zêdetir e".

**Hûrguliyên gera yekem**

Ajansa Nûçeyan a Tasnim a Îranî ragihand ku Wezareta Derve ya Îranê piştrast kiriye ku di van danûstandinan de, bi navbeynkariya Sultanatiya Umanê hatine kirin, Wezîrê Derve yê Îranê Ebas Eraqçî û Nûnerê Taybet ê Amerîkayê yê bo Rojhilata Navîn Steve Witkoff di derbarê bernameya nuklerî ya Îranê û rakirina dorpêçên li ser Îranê de nêrîn û helwestên hikûmetên xwe bi hev re bi rêya Wezîrê Karên Derve yê Sultanet Umanê, Bedir El-Bursaidî parve kirin. Danûstandin di atmosfereke avaker de li ser bingeha rêzgirtina dualî pêk hatin, û her du alî li hev kirin ku van danûstandinan di hefteya pêş de bidomînin.

**Gera duyemîn û sêyemîn**

Rûniştandina duyemîn derbarê dosiya nuklerî a di navbera Îran û Emerîka de di Roja Şemiyê 19'ê Nîsanê de li Romayê hate lidarxistin. Her wiha ku weke gera duyemîn hatibû pênasekirin, gihîştibûn biryara ku wê ev hevdîtin careke din pên pêkanîn. Li ser wê bingehê gera sêyemîn di 26'ê heyvê de li Umanê hat pêkanîn.

Weke encama ku di her sê hevdîtinan de heyanî niha hatine eşkerekirin, di derbarê dosiya nuklerî de her du alî li hev kirine û bi gotina ev rûnişkandin di cihê xwe de ne û erênî ne ji her du aliyan ve pêk hatin.

Hêjayî bîrxistinê ye ku Rêveberê Giştî yê Ajansa Navneteweyî ya Enerjiya Atomî, Rafael Grossi, eşkere kir ku Îran bi awayekî çalak Uranyûmê heta %60 dewlemend dike, ku ev rêje pir nêzîkî %90 ye, a pêwîst ji bo çêkirina çekên atomî ye.